**Newroz** Hejmar ( 73) Rûpel (6) Nîsan 2007z – 2619k

# .Bîranîna 109 saliya rojama Kurdistan

**Reşoyê Pîrê**

(**R**ojnamegerî, awayên gel e , zimanê nêrîn û ramanên wî ye , daxwaz , pêdivî û armancên netewî bi hêz diyar dike û dide xuyan )



Rola rojnamegeriyê , ne tenê , ji bo parastina dîrok , çand , ziman , her tiştê bi gel ve girêdayî girîng e , bel.ê , bilî wê jî , hemî bûyer û rûdawên di pêvajoya dîroka wî miletî de , bûne diparêze . Ji bo parastin , pêşxistin û dewlemenkirina zimên, rojnamegerî xwedî roleke pir berz e. Rojnamegiriya her miletî vê rolê hildide ser milên xwe . Bi kurtî mirov dikare bêje, rojnamegerî " mirin û jiyan bi xwe ye"

Gelê Kurd wek netw, di rojhilata navîn de, kevnartirîn milet e. Xwedê roleke erênî di avakirina şaristaniya vê herêm. de lîstiye. Ji bo maf û azadiyên xwe , bi dehan raperîn û serhildan rakirine. Lê mixabin, wek dewleteke serbixwe nehatiye avakirin û zimanê wê nebûye zimanê dewlet û desthilatan. Dagîkeran, welatê Kurdan, bi her awî xebitîne ku, Kurdan ji holê rakin, çand û ziman tune bikin û wan ji netewbûn û taybetmendiyên xweser bikin. Ji ber van sedeman jî, rojnamegeriya Kurdî dijwartir bûye. Li hember vê zordariyê, Kurdhez, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd , ji bo vê riya pîroz pir caran giyanê xwe kirin qurban .

Ji ber zilm û zora destlata Osmaniyan, pir kurdperwer, rewşenbîr û têgoşerên Kurd penaberî dûriyê bubûn.. Li dûriyû, merc, heyam û bûyerên nû peydabûne. Di wê rewşa neçariyê de û li gor wan merc û bûyeran, rewşenbîrên me çekên xwe guherîn , çeka hişyarî , zanebûn, raman û zimanê dê rakirine.

Di rewşa neçariyê de, li Misirê – Qahîrê - Şahsêwarê pyevê, mîrê gewre, Miqdad Midhet Bedir-xan dest davêje pênûsa xwe, kar û xebata rojnemevaniyê dike. Di 22 . Nîsana 1898 an de, yekem rojname bi zimanê Kurdî bi navê (**Rojnama Kurdisan** ) diweşîne. Li gora berpirsiyar û xwediyê rojnamê, di hejmara yekê de nivîsiye ku, rojnama Kurdistan wê her ( 15 ) rojan were weşandin. Ji 22 . Nîsana 1898 – 1902 an sî û yek hejmar ji rojnamê hatin weşandin, (1-5 ) li Qahêrê ,( 6-19 ) li Cinêv , ( 20 –23 ) li Qahêre ( 24 ) li Londin , ( 25-29 ) li Folkston û (30-31) li Cinêvê. Ji ber guhartina cihê wê, ev rojname , bi rojnama gerok hatiye nasîn. Lê mixabin, ew soza xwediyê rojnamê daye, ji ber merc û nîrên heyî pêknehatiye. Piştî derçûna hejmara 5 an ji rojnamê û belavkirina wê li nav Kurdan, Sulatnê Osmanî , bi çavsorî li hember rojnamê sekinî û bi destê zorê, M . Bedir-xan vedigerne Stembûlê. Lewre, birayê wî mîr Ebdirehman, li Cinêvê berdewamiya derxistina rojnama Kurdistan dike. Di hejmara şeşan de weha dinivse (( ***Ev cerîda biraê min Meqdad beg derdnî, lakên çiko xinkar nehêşt ew li Misirê ronît, vegera Istenbûlê, cerîdeya xwe nikaî li Istenbolê derbînêt ))***